

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT





ZAROK FÊKIYÊN MALANE

HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇÎROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJIN

KULÎLK

ŞÊX Û XATÛN


Mîrzo merovekî feqîr bû û toka malêk giran di sutade bû. Ji bo ku kar li gundêvî kem bû, mîrzo biryar da, ku here bajêr û li wê derê ji xwe re karekî bibîne.



Mîrzo xatir ji mala xwe xast û berê xwe da bajêr. Wî li kar pirsî û ji xwe re karekî emeletîyê dît.

Di wê demê de, meçîdî û zer dihat bikaranîn. Mîrzo piştî demekê çend zerê wî çê bû. Ji bo kesek ji wî nedize, çû mala şex û jêre got:

-Heyran ez biyanîme û ez hatime xebatê vêderê. Çend zêrên min hene, ez dixwazim wan bi emanetî dînim cem te.





Şex li xwe dananî, ku li zêra jî binere û ji mîrzo re got:

-Xortê delal, hema dîne wê taqika hanê.

Mîrzo her çend rojan dixebitî û zêrek an du zêr kar dikir, berê xwe dida mala şêx û ew jî dixist wê taqikê.

Piştî çend mehan, Mîrzo bêrya zarê xwe kir û biryar da, ku wegere mala xwe. Berê xwe da mala şêx û ji şêx re got:

-Heyran, welê ez dixwazim vegerim malê û ez hatim wan emanetên xwe bibim.



Şêx wek ku wî nasnake lê vegerand:

-Çi emanet?

Mîrzo:

-Şêxê min, ma min çend zêr li cem te bi emanetî dananibû û her min zêrek kar dikir min ne datanî cem te?

Şêx:

-Wa! Ma qey ez derewa dikim, çi emanet?

Mîrzo polî poşman ji mala şêx derket û fikirî, ku ger ew ji xelkê re jî bêje, kes jî wî bawer nake. Mîrzo yê belengaz li ber sîya qesrekê rûnişt û ji bê çaretî ket mijûlî û xeyalan.

Cêrî di pencerê de dibîne, ku merovek li ber sîya qesrê rûniştîye û mijûl dibe. Cêrî meraq dike, ma ka derdê wî merovî çî ye, ku wî lo mijûl dibe. Cêrî ji xatûna xwe re dibêje û xatûn jî tê ber pacê û li mîrzo yê reben dinere. Xatûn jî mereq dike û ji cêrî ye re dibêje:

-Her bangî wî merovî bike, bê ka çi derdê wî heye, ku wî lo ketîye mijûlî û xeyalan.

Cêrî dehere cem wî û jê re dibêje:

-Xatûn dixwaze te bibîne, ma ka çi derdê te heye, ku tu wî lo mijûl dibe.

Mîrzo:

-Heyran dev ji min berdin. Derdê hatîye se-

rê min besî min e. Ma xatûn ewê bi çî awayî
dikanibe derdê min çare ser bike!

Cêrî:

-Wilo nebê! Her derdek dermanekî wî heye.
Ma tê bi çî xwe bixesire, ku tu were cem xatûnê.



Mîrzo û cêrî bi dirêncekên qesrê hildikşin û deherin cem xatûnê. Mîrzo tiştê bi serê wî hatibû ji xatûnê re dibêje. Xatûnê piştî li mîrzo guhdarî kir, jê re got:

-Ev be, ev hêsane. Ezê tevnek wilo ji Şêx re li darxînim, kutucarî ewê wê ji bîr neke. Ezê çî zêr û xişlên min heye têxim nav buxçikekê û herim cem Şêx. Ezê bêjim; Şêxê min zilamê min çû ye hecê. Ev bû mehek zêde, ku hecacî ji Hecê vegerîyanin malê xwe, lê ti deng û bahs ji zilamên min nehat. Ez pîrekim û zilam di malê de tune ye. Ez fikirîm, a baş ewe, ku ez van xişlên xwe emanetî cem merovekî emîn bikim. Qansî min pirsî, ji te emîntir kes tune ye, li vî bajarî. Gava Şêx çav van zêrên pir keve, ewê tumayî jê re çê bibe. Tu jî wê gavê were hundur û emanetê xwe ji Şêx bixwaze. Şêx jî bo van zêrên pir ji destê xwe nerevîne, ewê çend zêrên te bitede. Gava te zêrên xwe sitend, bira cêrî di hundur keve û bêje: "Xatûn, mizgîna min li te, efendiyê me ji hecê hat"

Gotinên Xatûnê berbe serê Mîrzo hat. Xatûnê hazirya xwe kir, buxçika zêran xist bin çengên xwe û berê xwe da mala Şêx. Xatûnê wek ku berê gotibû ji Şêx re got. Gava Şêx çav wan zêran ket, çavên wî firê bû. Di wê demêde Mîrzo ket hundur û ji Şêx re got:

-Şêxê min,hinek emanetên min li cem te bû.Ez hatim wan bibim,ji ber ku ez dixwazim vegerim gundê xwe.

Şêx,wek ku tiştê nebûye û berê xwe jî neda wî û got:

-Xortê delal,emanetê te di wê taqa han deye.Wek te çawa danîbû,wilo li wê derê ye.

Mîrzo rahişt zêrên xwe.Di wî wextîde Cêrî ket hundur û got:

-Xatûn,mizgîna min li te,efendiyê me ji hecê hat.

Ser wan gotinên Cêrî ye,Xatûn rabû reki-sî.Mîrzo û Cêrî jî rabûn rekisîn.Şêx li wan nerî,ew jî rabû rekisî.

Xatûnê ji Şêx re got:

-Şêxê min,hela ê min zilamê min ji hecê hatiye ez direkisim.Cêrî jî,dibê belkî efendiyê wê ji wê re diyariyek anîbe direkise.Mîrzo jî,ji bo emanetê xwe sitendîye direkise.Ma gelo ji bo çî tu direkise?

Şêx keserek kişand û li Xatûnê wegerad:

-Ez jî li ber dek û hîlên we direkisim.

Berevkar: Bavê Hêvî


NAVEN WAN TÎŞTANAN LÎ BÎNE WAN BÎNÎVÎŞÎN



.....



.....



.....



.....



.....



.....

QUNCIKA DÎROKA EDEBYETA KURDÎ

Xwendevanên hêja!

Wek gelek tiştên me, edebyeta Kurdî jî di gelek asteng û zahmetyande derbas bû ye û hîn jî derbas dibe.

Tade û zordariya li ser gelên me, li ser edebyeta me, ziman û folklorê me jî bi diwarî hatiye domandin.

Lê gelê Kurd, tu carî li himberî wê zilm û zordariya kolonyalistên xwûnhar serê xwe netewandiye, hebûna ziman, edebiyet û folklorê xwe heta iro parastîye.

Lê bê guman ji ber wan zordariyên û zahmetiyan, gelê me gelek tiştên giranbûha jî wê xezînan xwe jî wenda kirîye. Gelek caran kolonyalistan bi hezaran pirtuk, şêr û beyt şevitandin.

Tiştên ji ber destên wan xelas bûne û he- ta iro hatiye, pêvîste em wan wek cavên xwe biparêzin û nehêlin ew wendabibin.

Di vî warî de, merovên heja û bi nav û deng Qanatê Kurdo karekî gelek giranbûha û berbicav pêkanîye. Ew xebata Prof. Qanatê Kurdo, bi navê "Tarîxa Edebyeta Kurdî" jî alî "Weşanên Roja Nu" de hat weşandin.

Me jî, ji wê pirtukê çend şayîr ê Kurd neqandîn û bi kurtayî dixwazin ji were peşkêş bikin.

FEQÊ TEYRAN

Navê wî ê rastî " Mehemed Feqî " ye. ew ji Hekarî ye û di sala 702 hîcrê(1375-76) hatîye dinya yê.

Beytên "Şexê Senan", "Hespê reş" û "Bersîs" nivîsarên wî ne.

Gelek şêr, beyt û stranên wî di nav civata gelê Kurd de belav bûne. Şêr, beyt û stranên wî ne hew li ser ol û evînîye ye; gelek şêr û beytên wî li ser fîlozofîyê û welatperwerîyê hatine nivîsandin.

Prof. Qenatê Kurdo berhevîya nivîsarên Feqê Teyran dike dû cûran:

"a) Şêr, helbest û qesîdên belav-belav,

b) çend çîrok û destanên aynê û netevîtî. Feqê Teyran yek ji wan kesan bûye, ku çîrok bi kurdî nivîsîye.

FEQÊ TEYRAN Û QULING

Hey qulîngo xwe newestîne,
P'er û baskan her hilîne,
Here, ji tebîyetê ji minra giliya bîne,
Îro li ser rîyan ez rêwîme,
Tu li hewa xweş cibâr be,
Ser gaz û gêdûka bilind xwar be,
Hema ji derdê dilê min hişyar be.

FEQÊ TEYRAN Û EVÎNA DILA

Nero dilo, dilê bazi,
Çi ji halê min dixwezi,
Bese biki hewar û gazi,
Te ez kirme belengazi.

Îro siveke ji her sivane,
Ez xiyala dilda mame,
Nizanîm, Şerqê hatme Şame.

Nero dilo tu bi tifiq,
Tu rêwîyî heta mifriq,
Hero dilo, çira wusa dik'ewgiri ?

Bese, biki şin û giri,.
Hesab bite -qet ne li virî.
Çira ji evna zor digiri ?
Birîna dilê min sax û silî,
Ji kezevê da dixilî,
Her dil bike şin û giri.

Dilê min insanê bê ziman,
Li min dike hewar û ferman,
Gelo ji bo çi ez li vir na mam ?
Sed û pênc salê min bûn temam.

Vê seyadê li min da bû,
Li min behra mezin rabû,
Hero dilo ji xewê rabe,
Xema dil wê belav be,

Ji Belqizayê nayê cabe,
Kofiya hilkev xemilî serda,
Keçik hat, rabûm berda,
Gelo kê ji dilê min xeber da,



FEQÊ TEYRAN Û DÎLBER

Way Dîlbera dêm bi şemal
Bo te digirim war bi war,
Her bo te bûm xirab mal.

Tu Dîlbera esil zade,
Te ji min biriye çax û wede,
Qinyat dilda bûye bê sewde.

Tu dîlbera mine E'nela,
Îro qewî ji min bûyî cuda,
Ez mame bêhiş û bê sewda.

MIJÛLÎ



Di nav herdu resman de 5 tişt ne wekhehin
Ma hûn dikarin wan bibînin ?

QUNCİKA MUZİK Ê.

Notenivîs: Cemîla Celîl

KINA MIN 18.

Allegro

Ki - na min ki - ni - ke, lê, Ki - na min ki - ni - ke, wey.

Ki - na min ki - ni - ke, lê, Ki - na min ki - ni - ke, wey,

Ga - va xwe çê - di - ke, lê, Ma - la mi(n)xi - rab di - ke.

Kina min kinike, lê, }
 Kina min kinike, wey, } 2
 Gava xwe çêdike, lê,
 Mala min xirab dike.

Kina min kin nîne, lê, }
 Kina min kin nîne, wey, } 2
 Gava xwe dixemlîne, lê,
 Canê min dih'elîne.

Berbûş û Berbûşe, lê, }
 Berbûş û Berbûşe, wey, } 2
 Ferfere bi p'ûşe, lê,
 Kina min bi dergûşe.

Hêlûn û hêlûne, lê, }
 Kina min xatûne, wey, } 2
 Gava xwe dixemlîne, lê,
 Aqilê min diçelqîne.




WERE WERE LO !

Zozan gelek xweşe
Were were lo.
Rihan û sosin geşe
Were were lo.
Bo doza Kurdîstanê
Were were lo.
Keç û xort tev bimeşin
Were were lo.
Berî tev rez û dare
Were were lo.
Sira wî çikas sare
Were were lo.
Ji bo mafê Kurdîstan
Were were lo.
Gundî her wekî şêre
Were were lo.
Çiyayê me bilinde
Were were lo.
Kurd dihezin ji binde
Were were lo.
Ji bo doza Kurdîstan
Were were lo.
Karker bera neyarde
Were were lo.
Deşta me hê deng nake
Were were lo.
Ew şer û ceng nake
Were were lo.
Bo doza Kurdîstan
Were were lo.
Kurdo çeka bilinke
Were were lo.

Şaxê Ciwan

KURDÎSTAN


NAVÊ VAN HEYWANAN LI BINÊ WAN BINIVÎSIN



.....



.....



.....



.....



.....



.....




.....



.....

GERGEDAN



Gergedan ji wan heywanên berê, yê herî
kevne. Qansî tê zanîn, gergedan ji berî nu
ha 55 milyon salan û heta îro jiyanan xwe
didomînin.

Penç şiklên gergedanan hene:

- 1- Gergedanên reş,
- 2- Gergedanên sipî,
- 3- Gergedanên Sumatra,
- 4- Gergedanên Hind
- 5- Gergedanên Java.

Lê mixabin ew ji alî neçîrvanan ji bo qoçên wan tê kuştin. Merov dikane bêje, ku qoçên wan bû ye bela li berê wan. Kg a qoçê wan bi 900 dolarî tê firotin. Gergedankî mezin qoçê wî li der-dora 5 kg tê. Li gel vê ya, gelek merov jî bawer dikin, ku qoçê wan ji bo îştaha însên, ji bo taya germ û ji bo sekinandina xuna pozan jî derman e.


Di sala 1970 de li rojawa û başûra Afrîka 65000 gergedanên reş hebû. Lê îro li derdora 4000 gergedan manin.

Li Yemen a bakur xencerek qewza wê ji qoçên gergedana, di nabêna 500 û 12000 dolar tê firotin.

Ji bo neçîra gergedana nebe, li Zîmbabwe gelek tedbîr û cezayên giran danîne. Lê li gel wan tedbîran jî, neçîrvan neçîra wan di-kin û hejmarên wan roj bi roj kêm dibin.

* * *

WAN HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHĪNIN HEV



Q U N C I K A P Ê Z A N Î N Ê

Pirs: 1

Sêsid û şêst reşêle,
Dozdeh ga û du çêlek,
Nêvî reş,nevî belek,
Ew çîye ?

Pirs: 2

Ew kî ye ?
Ku mehê carekê kal dibe,
dimre û dîsa dizê.

Pirs: 3

Hildikşim ser zinara
Lêdixim,deng diçe hezara,
Ew çîye ?

Pirs: 4

Tişkî min heye,
Bê ruhe,lê dimeşe.
Ew çîye ?

$\begin{array}{r} 36 \\ -13 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 23 \\ -12 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 46 \\ -23 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 48 \\ -18 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 34 \\ -14 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 55 \\ -22 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 69 \\ -26 \\ \hline \end{array}$
-----	-----	-----	-----	-----	-----	-----
$\begin{array}{r} 47 \\ -21 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 41 \\ -30 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 44 \\ -20 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 68 \\ -37 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 34 \\ -14 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 78 \\ -12 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 56 \\ -33 \\ \hline \end{array}$
-----	-----	-----	-----	-----	-----	-----

$\begin{array}{r} 46 \\ +13 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 35 \\ +12 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 81 \\ +16 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 57 \\ +5 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 33 \\ +8 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 48 \\ +7 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 68 \\ +6 \\ \hline \end{array}$
-----	-----	-----	-----	-----	-----	-----
$\begin{array}{r} 67 \\ +21 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 48 \\ +14 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 32 \\ +12 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 43 \\ +42 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 25 \\ +15 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 47 \\ +16 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 59 \\ +35 \\ \hline \end{array}$
-----	-----	-----	-----	-----	-----	-----
$\begin{array}{r} 19 \\ +23 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 57 \\ +14 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 28 \\ +11 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 46 \\ +36 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 64 \\ +28 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 26 \\ +18 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 79 \\ +16 \\ \hline \end{array}$
-----	-----	-----	-----	-----	-----	-----
$\begin{array}{r} 55 \\ +26 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 18 \\ +28 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 34 \\ +46 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 67 \\ +27 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 74 \\ +19 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 38 \\ +29 \\ \hline \end{array}$	$\begin{array}{r} 29 \\ +37 \\ \hline \end{array}$
-----	-----	-----	-----	-----	-----	-----

$3 \cdot 4 = \underline{\hspace{2cm}}$

$2 \cdot 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$3 \cdot 1 = \underline{\hspace{2cm}}$

$4 \cdot 1 = \underline{\hspace{2cm}}$

$0 \cdot 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$4 \cdot 2 = \underline{\hspace{2cm}}$

$5 \cdot 3 = \underline{\hspace{2cm}}$

$4 \cdot 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$2 \cdot 1 = \underline{\hspace{2cm}}$

$2 \cdot 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$4 \cdot 3 = \underline{\hspace{2cm}}$

$3 \cdot 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$5 \cdot 4 = \underline{\hspace{2cm}}$

$0 \cdot 4 = \underline{\hspace{2cm}}$

$2 \cdot 3 = \underline{\hspace{2cm}}$

$3 \cdot 3 = \underline{\hspace{2cm}}$

$2 \cdot 0 = \underline{\hspace{2cm}}$

$3 \cdot 2 = \underline{\hspace{2cm}}$

$13 - 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$17 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$14 - 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$14 - 7 = \underline{\hspace{2cm}}$

$16 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$15 - 6 = \underline{\hspace{2cm}}$

$12 - 4 = \underline{\hspace{2cm}}$

$18 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$13 - 7 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 3 = \underline{\hspace{2cm}}$

$16 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$15 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$13 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$12 - 7 = \underline{\hspace{2cm}}$

$14 - 6 = \underline{\hspace{2cm}}$

$17 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$16 - 7 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 4 = \underline{\hspace{2cm}}$

$12 - 6 = \underline{\hspace{2cm}}$

$13 - 6 = \underline{\hspace{2cm}}$

$14 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$12 - 5 = \underline{\hspace{2cm}}$

$13 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$12 - 3 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$14 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$12 - 8 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 2 = \underline{\hspace{2cm}}$

$15 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$13 - 4 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 6 = \underline{\hspace{2cm}}$


$12 - 9 = \underline{\hspace{2cm}}$

$11 - 7 = \underline{\hspace{2cm}}$

$15 - 7 = \underline{\hspace{2cm}}$







M I J Û L Î



Ma hûn dikarin alîkarîya vê pisîkê bikin, da ku xwe bighîne cem wî xortî ?

XAÇEPIRS



QUNCIKA PÊZANÎN Ê.

Pirs: 1

Zîq zîq, heyşt ling û du pîq, çî ye ?

Bersîv: Cotkarî û cotê ga

Pirs: 2

Tişkî min heye; şewq`dide avê û şil nabe,
ew çî ye ?

Bersîv: Roj....

Pirs: 3

Tişkî min heye; ji ezman dikeve naşkê, dike-
ve nav du keviran dişkê, çî ye ?

Bersîv: ... Nok

Pirs: 4

Tişkî min heye; merov davê jor sipî ye, li
erdê dikeve zer dibe. Çî ye ?



Bersîv: Hêk ...

Pirs: 5

Tişkî min heye; tum û tum axê li serê xwe
dike, çî ye ?

Bersîv: Gîsin û cot

XAÇEPIRS





4



7







YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS

: 10:- skr

BIHA